



Dr. Nûredîn Zaza  
1919 - 1988



Osman Sebrî  
1905 - 1993

Xebat ji bo :

- \* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
- \* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
- \* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (155)

Sal 28 12 Rêbendan 2023 z - 2634 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com

Buha (100)L.S

## Di -74emîn Bîranîna Roja Cîhanî Ya Mafên Mirov De



### Desteya sernivîser

Piştî şerê cîhanê yê diwemîn (1939-1945), yê ku li gora amarên fermî yên Rêxistina Netewên Yekbûyî (UN)-ê, bêtir ji 100 milyon mirovên

bêşûc û bêguneh jiyana xwe jidest dane; di tenûrên Holokostê de jî, bi hovîti û kîneke reş, bi milyonan mirov hatine şewitandin û bûne arî; li Hêroşîma û Nagazakî jî, bombeyên


navokî ên malwêranker hatine bikaranîn, gund, bajar û paytextên gelek welatên Ewropayê kavi bûne; li hawîr, golên xwînê, mirin, perîşanî û belengazî belav bûne!

Bi saya kar û xebata aqilmend, civaknas û xêrxwazên li dijî şer, û da ku careke din mirovatî tûşî van bobelatên xwîndar nebe, Roja 10-ê Berçîleya sala 1948-an, .... **2**

### Teqîna Istenbolê û Bêbextiya Mezin!

#### Desteya sernivîser

Roja yekşembê, 13ê Çiriya Paşîn a 2022-an, li kolana Istiqlal a bi ser gastîna «Teqşîm»-a Istenbolê ve, teqîneke xwîndar e mezin rûda, di encamê de, 6 kes canê xwe jidest dan û bêtir ji 80-ê kesî jî birîndar bûn. Yekser, bê lêkolîn û belge, şalyarê karûbarên hundir ê Turkiyê /Silêman Siwêlo/ rêxistina PKK bi teqînê



sûcdar kir, û tekez kir ku polîs mirovek girtiye ku wî bombeya teqîner .... **3**

### Daxuyaniya 26-mîn a Kongreya «IS»

Li dawîya rûniştinên kongreya «Rêxistina Sosyalist a Navnetewî» ku li dirêjiya 3 rojan li Medrîdê /paytexta Ispanyayê hate girêdan, Koma(Kolisiyona) Kurdî di «Rêxistina Sosyalist a Navnetewî» de ku ji partiyên (PYD, HDP, YNK) pêkhatî bû, pirojeya daxuyaniya karûbarên Rêxistinê sebareti Pirs a Kurdî li Rojava û Başûrê Kurdistanê digel

pêşveçûnên dawî yên siyasî û êrişên Turkiyê ser bakur û rojhilatê Sûriyê û Başûrê Kurdistanê pêşkêşî kongreya 26ê ya «Rêxistina Sosyalist a Navnetewî» kir. Û piştî gotûbêj û dengdanê, bi piraniya dangan ew proje hate pejirandin.

Di wê daxuyaniyê de, wiha hatiye nivîsandin: Ew şerê ku ji dehên salan ve dijî gelê Kurd li hemû parçeyên .... **2**

## Daxuyaniya 26-mîn a Kongreya «Rêxistina Sosyalist a Navnetewî»

### Derbarê Pirsê Kurdî û Êrîşên Turkiyê... Dumahîk

welatê wî birêve diçe, îro ketiye qonax û xaçerêyeke dîrokî, gef li hebûna wî tê xwarin, hêminî û aramiya vî parçeyê cîhanê dikeve metirsiyê.

Evê netewa ku karîbû tundtirîn rêxistina terorist di dîroka mirovatiyê de «Daiş» li Rojava û Başûrê Kurdistnê tîk bibe, îro ew netew rûbirû rastî şerê tunekirin û qirkirinê bûye. Ew şer dixwaze civaka Kurdî bi hemû pêhatyên wî di warê çandî, şaristanî û binesaziyê de birûxîne û hilweşîne, demografiya deverên Kurdî biguhêre û gelê Kurd taromar û wêran bike.

Ji ber ku «Rêxistina Sosyalist a Navnetewî» li ser asta cîhanê rêxistina



demokrasiyê û aştiyê ye, ew piştgiriya xwe ji xebata gelê Kurdbobidestxistina mafên wî yê rewa nîşan dide û daxwaza rawestandina yekser a hemû cûreyên şer dij netewa Kurd di warê leşkerî, çandî û aborî de dike. Dubare em tekez dikin ku şer, ji bo vê dozê, ne rêya çareseriyê ye, lewra

em daxwaz dikin ku hemû operasyonên leşkerî yê dewleta turkiyê rawestin, çiku bi vî şerî, rê û derfet li pêş rêxistina Daiş vedibin ku careke din ew xwe birêxistin bike, û terorê li hawîrdor belav bike.

Ji bilî diyaloga siyasî di navbera hemû aliyan de, tu rê li pêş çareserkirina pirsê

Kurdî tune ye. Tenê, bi vî rengê çareseriyê, hêminî û aramî dikarin li deverê cih bigrin û ev gava han jî, dê li cîhanê bi gelemperî û Ewropa bi taybetî, bi erênî û başî vegere.

**Kongreya 26-mîn a «Rêxistina Sosyalist a Navnetewî»**  
27.11.2022 Z

### Di 74-emîn... Dûmahîk

Komeleya Giştî Ya Yekîtiya Netewan, «Danezana Cîhanî Ya Mafên Mirov» ragihandiyê, bi pêşgotinekê û 30 bendî, mafên mirovan yê bingehîn destnîşan kirine, ku ji bo mirov û mirovatiyê, ew gava herî li pêş bû, û li seranserî cîhanê ew roj, mîna Roja Cîhanî Ya Mafên Mirov binav bûye.

Hin bendên wê danezanê, wiha dibêjin:

Bend 1. Hemû mirov azad jidayik dibin, di parastina maf û rûmeta xwe de, hemû mafdar in, û da ku bi giyanê biratiyê bi hev re danûstandinê bikin, ew xwedî hiş û nîhad(wijdan)

in.

Bend 2. Bê cudahiya regez, rengê çerm, zayend, ol, baweriyên siyasî û yê ne siyasî, koka niştimanî yan civakî, saman, zayîn, yan jî çi rewşeke din hebe, mafên her mirovekî di hemû bendên vê danezanê de hene.

Bend 3. Mafê her mirovekî di jiyaneke azad û parastina rûmeta kesayetiyê wî de heye.

Lê îro, di siha gurbûna nakokiyên aborî û siyasî di navbera hêzên mezin ên cîhanê de, ku gihane asta dijminatîyê û metirsiya derketina şerekî mezinî malwêranker serî hildaye, bendên vê belgeya dîrokî,

ji naveroka xwe hatine valakirin, tu rêz û rûmet ji wan û hemû belgeyên mafên gelan re nema ye!

Di vê bîranîna pîroz de, îro li Sûriyê, Libnan, Îraq, Yemen, Lîbya, Ukraniya û gelek welatên din, xwîna mirovan diherike. Li Îranê, rojane xort û qîzên ciwan ên azadîxwaz bi sêdaran ve tene bidarvekirin. Li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî jî, nişteciyan Kurd ji malên xwe hatine derxistin û li çolistanan di bin konikên rizî de dijîn, û biyanî di malên wan de hatine cîwarkirin, ew li benda vegera malên xwe ne! Di bîranîna Roja Cîhanî Ya Mafên Mirov de, Ji

sitemkarî û zordestiya hin mirovan, mirov û mirovatî kûr dinalin!

Da ku careke din tu şerên xwîndar li cîhanê dernekevin û paşeroja hemû gelan nekeve tariyê, pêwist e careke din civaknas, aqilmend û zanyarên cîhanê li dijî zêdegaviyên derbarê mafên mirovan dengên xwe bilind bikin, û pirs û gelşeyên di navbera dewletan de, bi rêya hevdîtin û diyalogê çareseriyê bibînin, Yekîtiya Netewan li ser bingehine nû bête nûjenkirin, û li şûna şer û pevçûnan, aşî, azadî û wekhevî belav bibe!

## Teqîna Îsten... Dûmahîk

li gastînê çandîye.

Lê, pir dirêj nekir, ragihandinên cudacuda ji aliyê berpirsên dewletê ve hatin weşandin, yek ji wan ew bû ku dezgehên dewletê piştî lêkolîn û lêpirsînê 49 kes binçav kirine, ji nav wan jinek bi navê Ehlan-Elbeşîr e, xwedêgravî wê jina Sûrî li ser destên şervanên YPG li Kobaniyê rahênan dîtine û di rêya Kobaniyê re ew derbasî Turkiyê bûye, li maleke Kurd li Istenbolê bûye mêvan û wê teqîn pêk aniye!

Lê, paşê, Fermanderê Giştî yê QSD General Mezlûm Ebdê bi belge teqez kir ku malbata wê jina navborî bi rêxistina Daiş re têkildar e, 3 birayên wê yên Daişî hatine kuştin, û yekî din jî ji wan hevalê terorîstan e, û ta niha jî ew li Efrînê dijî, û hate zanîn ku ew di rêya Efrînê re, ku di bin kontrol û dagirkeriya dewleta Turkiyê û çeteyên girêdayî wê de ye, derbasî Turkiyê bûye!

Lê, peyamnêrê RÛDAWê di hevpeyvînekê de li gel jina Kurd a ku, qaşo, Ehlan li Istenbolê li wan bûye mêvan û li cem wan raza ye, derewa ragihandina fermî ya dewleta Turkiyê tazî û aşkere kir, dema jinê got: «polîsên dewletê ev jina bi navê Ehlan El-Beşîr anîne mala me û ji me xwestin ku ew çend sa'etan li me bibe mêvan, lê hevjinê min ew ne pejirand û got



çawa ewê keseke ku wê nas neke li mala xwe bi mêvanî bipejirîne! Paşê polîsan hevjinê min binçav û zindan kirin!».

Aşkere û zelal hate xuyakirim ku pilana wê tewana hovane, bi destên dezgehên ewlekariyê yên Turkiyê hatiye hûnandin, wekî berî niha jî çawa li Persûsê û gelek deverên din, tewanên wiha pêkanîne, xwîna mirovan rijandine, û kujer radeştî dadgehan nebûne!

Mîrov dikare hin ji armancên bermayên Ergenekonê, mafya û dewleta Kûr a Turkiyê ji wê teqînê texmîn bike, ku hin ji wan ev in:

1. Dîtina behaneyekê da ku ew êrîşê bibe ser Başûr û Rojavayê Kurdistanê.

2. Reşkirina wêneya Kurdan û tevgera wan a siyasî li hember raya giştî ya cîhanê û wan mîna terorîstan bide nîşandan.

3. Nameyekê bigihîne gelê Turkiyê, naveroka wê ew e, ji ber ku siyaseta hikûmetê û serokê wê ya (welatparêz û Turkperest) rast û dirust e, ew ji bal (terorîstên) Kurdan ve tê armanckirin!!, pêwîst e di hilbijartinên bîr de, hûn

deng bidin wê hikûmetê û wê siyaseta biparêzin!

Hêjayî gotinê ye ku di wê derbarê de, KCK û Hêzên Sûriya Demokrat bi du daxuyaniyan, ew teqîna terorîst şermezar kirin û berpirsiyariya xwe di ber de red kirin.

Piştî hefteyekê ji teqînê, roja 20ê Çiriya Paşîn 2022 Z, bi wê behaneyê derewîn, dewleta Turkiyê dest bi êrîşan li ser Rojava Kir, bi balefirên cengî, diron û topên giran, gund, bajar, nexweşxane, binesazî, navendên elektrîkê û navendên petrolê û avê bombebaran kirin, tenê li Teqilbeqil a bi ser Dêrikê ve, 11 kes bûne cangorî û gelek mirov birîndar bûne!

Di wê kuştin û sitemkariyê, vî şerê gemar de, hevalbendên Kurdan li dijî Daişê û herdu dewletên mezin ên xwedî rol, Rûsya û Emerîka ku ew di ber ewlehiya deverê de berpirsiyar in, çavên xwe ji wê tewana mezin a dij gelê Kurd girtin, hilwesta wan pir qels û ne li gora bûyerê bû.

Digel ku berpirs û rayedarên Emerîka, Rûsya û Hevbendiya Navdewletî li dij Daişê, ji her kesî bêtir

rastiya teqîna «Teqîmê» dizanin jî, lê dîsa ji bo me Kurdan, ew Turkiyê ji xwe naxeyidînin, hê jî vî benîştî dicûn û dibêjin:

«Metirsiyên Turkiyê ji bo parastina ewlehiya xwe ya netewî rewa ne»!!

Piştî ku rêxistina Daişê bi destê şervanên Kurd (YPG, YPJ û PÊŞMERGE) hatiye bezandin û li Avdara sala 2019an, bi destê Şervanên QSD, paytexta wê li Reqayê û asêgeha wê ya dawî li Baxozê hatine rûxandin û bermayên wan dîl hatine girtin, doza Kurdî mîna dozeke dadmend li Rojhilata Navîn berz bûye û çareseriyê dixwaze; hikûmetên Turkiye û Îranê û şovenên Ereban, hewil didin rê li ber wê dozê bigrin û wê tîk bibin, bi şerê siyasî, dîplomasî û leşkerî bi hev re, şerê gelê Kurd dikin, û li ber çavan e îro çawa Rojava, Başûr û Rojhilat bi agirê kîn û zikreşîya wan tîne şewitandin.

Magelo êdî dem nehatiye ku em jî asta xebata xwe bilind bikin, destên biratiyê dirêjî hev bikin, bi hev re li hember pîlanên tunekirina gelê xwe bixebitin?

# Alaya Netewî ya Kurdî ... Hêma û Dîrok

## Mehfûzê Mele Silêman



Ji berê de hoz û miletan bendêrên taybet hildidan da xwe ji yên din cuda bikin.

Ji mêj ve, bendêr li pêşiya şerkeran di ceng û şeran de hildigirtin ji bo halan û navtêdanan, û diva bû hildayî be, çimkî daketina wê nîşana şikestin û revê bû.

Di dîroka hevdemî de, ala bûne kurteçîroka çand û mêjûwa gelan, û nasnameya niştimanî ya giştî ji hemî hemwelatîyan re.

Ala xwedan hêmayî û pîrozahî ye, termê cangorîyan pê dipêçin, û di hemî helkeftên netewî û niştimanî yên dewletan de tê hildan.

Ala, bendêr û dirûşimên ku dewlet, tevger û rêxistin radikin wekû hêmayan taybetmendiya xwe bi wan nîşan dîkin.

Lê alaya netewî ya kurdî ew bi xwe alaya gel û welêt e, cihê rêzgirtin û pîrozkirinê ye ji bal hemî lawên kurd ve, li hemî parçeyên kurdistanê û deverên belawela.



Ala bi wêne û rengên xwe dîrok û baweriyên gelê kurd rave dike, û erdnîgariya welatê wî Kurdistan diyar dike.

Her wekû em dizanin ku kurdan di dîroka xwe ya Kevin û nû de gelek dewlet û mîrnişînên serbixwe damezrandine, bê guman xwedan ala û beydaxên taybet bûn.

Pirtûkên dîrokî dibêjin: Dewleta Eyûbî alayeke zer û di nava wê de wênayê Sîsankê radikirin, rengê zer jî nîşana ronîya rojê û rastiye ye, û hêmaya rûmeta xwedayî ye.



Alaya kurdî ya nû ya bikarhatî û niha li herêma kurdistanê bilind dibe, ew ji bal (Komela rêxistina Civakî ya Kurdan) li Stenbolê sala 1920an hat çêkirin û bawer pê kirin, di heman demê de (Komela Te'alî Kurdistan) pesend kir.

Ew ala bi terz û rengên xwe wiha bû: Rengê sor li jor, rengê spî li navê û rengê kesk li jêr, û di nivê rengê spî de rojek zer bi 18 tîrêjan bû, lê ji bal benderiya (hikûmeta) kurdistanê ve hat dirust kirin, ku kirin 21 tîrêjen wekhev bi çêşin û qebarê xwe.

Jimara 21 di ola Êzîdî de pîroz e (ola Kurdan ya herî

kevin), wilo jî jimara 21 bal bi 21ê Avdarê dikişîne, an ku cejna Newrozê ye, cejna Sersala Kurdî ye.

Ev ala ya (roja bi axil) ji bal Komela Xoybûn ve hate pesendkirin, û ceneral Ihsan Nûrî Paşa li ser çiyayê Araratê di dema şoreşa Agirî de sala 1927an hilda.

Mîr Celadet Bedir-Xan di sala 1932an de li ser qapê Govara HAWAR (ya ku li Şamê bi zimanê kurdî derdixist) hejmara 11an danî, helbestek jî nivîsî, û tê de pesnê wê da:

**Alaya kurdan...**

**Di nivî de roj di çirisîn e...**

**Ji jor ta jêr...**

**Sor û sipî û kesk...**



Komara Kurdistan ya Dîmoqrat li Mihabad sala 1946an bi heman alayê bawer kir û li kaxa çarçira hilda, lê digel dû hoşeyê genim li her dû aliyê Rojê, û nivîsîna bazinkî (Dewleta Komara Kurdistan) li hawîr dora rojê.

Wilyam Îgilton li ser alaya kurdî li Mihabad dibêje: Di dawîya zivistana 1946an de, tîşkê rojê ji beyanî zû ve geşbûn, rojek xweş bû, mezinê mîlet û serokê hozan hatibûn tevî cemawerê pirjimar bûn, yê ji gundewarê kaxa

çarçira ya bi alayên kurdî xemilandî bû.

Roja alaya kurdî dikeve roja cansipartina jina ku alaya komara Kurdistan li Mihabad li ser daxwaza pêşewa Qazî Mihemed dirûtibû ye, ew jina pakrewan navê wê Fatima Esêed Şahîn e, li Hewlêra paytext di 17ê meha 12an sala 2012an de koça dawî kir, ew bi xwe ji malbatekê ji herêma Şemzînan e, di hemî tevgerên başûr û rojhilatê kurdistanê de beşdar bûye.

Berî bi darvekirina pêşewa Qazî Mihemed alaya rengîn wekû siparde da nemir Mele Mistefa Barzanî.

Nivîskarê cangorî Mûsa Enter di bîranînên xwe yên di sala 1948an de dibêje: Wan komeleyek nehan li Sitenbolê damezrand, endamên wê bi alaya sala 1920an sûnd dixwarin, û çêkirina alayekê sipartin wî, wî jî çar niv mitir caw ji her çar rengan kirin, û di ser hev re (ji jor ta jêr) wekû sê lakêşan nijinandin: sor, sipî û kesk, û di nivê ya sipî de rojeke zer, paşî rengan şirove dike: Rengê sipî nîşana aştiyê ye, û rengê sor nîşana şoreş û qurbaniyê ye, û rengê kesk nîşana şînahî û xuristiya kurdistanê ye, û heçîka rengê zer ew nîşana rojê ye, roj jî giringiyeke xwe ya çandî, olî û netewî ji mêj ve li nik kurdan heye, û bi xwe jî diruşmek olî ....

## Ger tu Zanibî Armancên Unîsêf Çine, Tê Zanibî bê Unisêf Çiye!

### Melek Murad

Ji bo parastina mafên zarok û dayîkên Ewropa, di Êlûna sala 1946 an de, li bajarê Niyoyorkê (Emerîka) weke rêxistinek taybet UNICEF hatiye damezrandin û di gastîna Ewropa de cih girtiye.

Pîştî Şerê Cîhanê yê Diwemîn, di sala 1953an de, dewletên navnetewî dîtin û biryar dan ku girîng e ev rêxistina Unicefê ji bo mafên hemû zarok û dayîkên cîhanê bê cudahî be. Di hemû asteng û rewşên dijwar de, ew ji tevan re alîkar û piştgir be, da ku zarokên cîhanê tev di heyameke wekhevî û tendirust de mezin û perwerde bibin! Lewre, Rêxistina Unicefê di nava -190 dewletan de bi hêz û balkêşî cî digirt û di çalakiyên xwe de reng û hewiş vedide, bi vî awayî, nav û dengê wê li seranserê cîhanê belav dibe.

Ji armancên Unicefê yê herî bingeîn evên jêrî ne:

1- Di şer û cengan de,

pêwîst e li zarok û dayîkan xwedî derkeve, wan ji birçîbûn, tehlûke û bivetiyê biparêze.

2- Di hemû bergehên xwendinê de bi wan re alîkar be.

3- Di warên têvel nola tendirustî û hwd de, ji wan re piştgir be.

Wêlomê jî, di şerê Sûriyê de, nemaze piştî Efrîna rengîn ji hêla rêjîma Tirkîyê ya faşî û dîktetor ve, digel çeteyên wê yê Opozisiyona Sûriyê ya Îslamî û radîkal ve dihate dagîkirin, û Efrîna me ya nazidar kavi û wêran dikirin, destên xwe yê bi qirêj û gemar dirêjî her kesekî dikirin, nemaze keç, jin û zarokên mendal, û hêj ew di zilim û zordariya xwe de bi hovîti, bê şerm û fehêt berdewam in!

Wê hingê, em ji hêla xwe ve, çar kes ji jinên Efrîna birîndar li vê biyanistanê, li şahrê Bonn/ Almaniya civiyan û me girîng dît ku em

tişteki ji bo xelkên xwe yê di hundir Efrînê de bikin, belkî em hinekî êş û birînen xwe û wan sivik bikin.

Bi vê armancê, me berê xwe dida navenda Unisefê, û namake vekirî û nivîsandî ku têde rewşa heyî berçav dibû, me dida wan. Pştî wan pêşewazî û guhdariya me dikirin, mixabin, weha ji me re digotin:

Em gelekî li ser rewşa Efrînê, nemaze ya dayîk û zarokên we xemgîn û dilşewat in, lê pir mixabin! Em nikarin alîkariya we û wan bikin.

Ji ber ku têkiliyên me bi dewleta Tirkîyê re hinekî di delîveke tenik û nazik re derbas dibin! Lewre jî em neçar in ku bédeng bimînin. Ê daxwaz û tika me ji we ew e, ku win vê serlêdana xwe nedine ragihandinê! Hingê me ziq li çavên hevdu dimeyzand û pir xemgîn û poşman li malên xwe vedigerîn!

Ji hîngê ve, pir pirsên rengereg di hiş û serên me



de xwe kom dibûn, Ma gelo gerek em kurd çî bikin ta ku rêxistina Unicefê li me kurdan xwedî derkeve?! Ma gelo vaye dozdeh (12) sal in welatê me Sûriya nazdar taromar dibe, ma qey ne bes e? Va ye bi sedan xelkên me di deryan, çol û geliyan de difetisin û li vê biyanistanê peregende û mişext dibin. Ma gelo ne bes e bi sedan jin û zarokên me li Efrînê, Girê sipî û Serê Kaniyê, di bin zext û zilma dagîrkerên bêbext de, dinalin û diqîrin, ma qey ev hê ne bes e!

Çiqas heyf û çî mixabin e ku têkilî û berjewendiyên dewletan têkel dikin, rûmet û mafên mirovan bînpê dibin, pir rêxistinên mafê mirovan weke Unicefê pûç û ji naveroka xwe vala dikin!

### Alaya Netewî... Dûmahîk

û netewî ye ji kurdan re, an ku ola êzîdî (yezdanî, rojanî).

Birêz Elî kurê pakrewan Qazî Mihemed serokê partiya Azadî Kurdistan diyar dike: Hemî aliyên Kurdistanî ji hemî parçeyên Kurdistanê li hev civiyan, levkirin û biryar dan ku alaya kurdî ya niha ne ya herêma kurdîstana Îraqê bi tenê ye, lêbelê (belam) hêmaya netewî ye ji bo

hemî Kurdan.

Di sala 1998an de Dr. Mehrdad Azadî û Bêcan Ilyasî belgeyek amade kirin, tê de alaya niştimanî Kurdistanî li gorî pîvanên naskirî dirust kirin, û ji bal navenda navdewletî ya alayan hate pesendkirin.

Di sala 1999an de perlemanê herêma kurdistanê biryar da ku ev nimûneya alayê bo herêma fermî be. û di civata xwe de, 11ê meha Çilê Pêşî sala 2009an roja 17an ji meha

12an (Çilê pêşî) bi «Roja Alaya Kurdî» binav kir.

Herwiha, aheng û şahî di vê rojê de li hemî deverên herêmê tene lidarxistin, û weynê alayê tene bilindkirin û li ser sîngên hevvelatiyan tene danîn, serbilindiyê û şanaziyê pê dikin.

Roja Alaya kurdî (17/12) li her welatparêz û niştimanperwerên kurd yê dilsoz û bi rûmet pîroz be...

Şege û pate digel sirûda Ey Rqîb...

Silav û dirûd ji bo giyanê

cangoriyên pakrewanan...

Soz û peyman bi bilindkirina simbola hebûn, azadî û serxwebûna kurd û kurdistanê nû dibin.

### Jêder:

- Malpera Rojava.
- Dîroka Alaya Kurdî, Dr. Mihemed Ebdo Elî.
- Komara Kurdî li Mihabad 1946, W. îgilton.
- Roja Alaya Kurdistanî, Mehdi Kakeyî.
- Çiroka Alaya Kurdî, Dilawer Zengî.

## Nanê Xwe Meke Tûrikê Biran!

Mihemed Qere Hesên



**P**ir xweza ye ku ramana netewî di nav kesên wê di belav bibe, û bibe parek ji heyîna wî ya giyanî, û pê şanaz û serfiraz be ku ew ji wê ye. Bi êşên wê re bisote û bi şahiyên wê re veje. Xwe bibîne lawê wê netewê û zarokê dîroka wê û bi bûyerên wê hatî mijandin û mezin bûye. Hevîrê xwe yê henasî bi pêvajoya wê hatî stiran.

Stûnên serek ên ku netew li ser ava bûye, beşek xwezayî ye û yê din jî kirarên merv in. Wek zemîngarî, ew cihê ku ew netewa li ser dijî, dîmen û nîrên jîngehî ku ew mervan çêkirine û jê fêrbûne. Nîrê din ku ziman li heyama xwezeyê ku cureyên dangan di gewriyan wî de çêkirî û teybet daye wî zibanî, derûn û rewşenbîriya wî başqe û têvel peyda bûye.

Beşê din jî bûyerên ku mervên wê netewê di hemî wanran de çî rewşenbîrî û çî jî daringî li şûna xwe hêştine û bûne mewdanên torinên wan, ew jî dibe dîroka şaristaniya wê netewê, û neviyên wê xwe beşek jê dibînin û xwe pê şanaz û serbilind dikin. Ew jî dibe nînkek ji wan re ku di rojevê û nihoka xwe de bijîn û li gor wan manda xwe pilan bikin, û di rewşa tedeyî de derbas bikin.

Çiqas dîroka netewekê geş be ewqas morala wê bilind

dibe, ku ji ber siba xwe ve bi îjdilî bixebitin. Ji ber wê bernasên wê netewê pir dibin û ronahiya xwe didin hişê mervan tev û nemaze kur û keçên wê. Ev rewş û tentêl li ba Kurdan pir dewlemind e bi taybet beşê êş û xeman, ji ber ku Kurd miletekî ji zû ve bindest û mafê wan jê hatî standin.

Di van pênc sed salên dawî de ji dîroka kurdî, zaf tevger, serhildan û şoreş li dijî çewsandarên xwe rabûne. Wan bûyeran jî bi xwe re hiş û rewşebîrî çêkirine, û bûne neynik û kaniyên zanînê ji netewa Kurd re, herdem çav û dilên xwe li wan cih û bûyeran e.

Di serdema cihangêriya (împiretoriya) Osmanî de, pir mîrîtiyên Kurdan çêbûne, wek dewleta Dostkî, Erdelanî, Babanî... Di van sed salên paşî de gelek şoreş û serhildan li dijî çewsandara dewleta Turk ya nû û dewleta Îraqê rabûne. Bi taybet komara Mihabadê, şoreşa şêx Se'îdê Pîran û ya Berzaniyê nemir, pir olan û vedenga xwe li hişê netewa Kurd kirine, ta roja îro di nîhad û hişveşariya wê de vedide. Ta niha berê hest û derûna gelêrî li wan çîrên vêketî bûne. Li ber wê ronahiyê raghandina piraniya partiyên tevgera Kurdên li Sûriyê taybet bi şoreşa Berzanî ve girêdayî bûn, pirtirî ku bi doza gelê Kurd li Sûriyê ve best bin. Ji ber wê ta roja îro hin partî piropaganda xwe li ser wê rêyê ne û rewaya xwe ji wê raman derveyî dademendiya doza

Kurd li welêt dibin.

Lê mixabin partiyên Kurdistan başûr û bakur destêwerdana doza kurdên Sûriyê kirin û pir caran xwestin bi çî awî be şûna tevgera Kurd li Sûriyê bigrin û biryara wan ya li Qamişlê, Efrînê û Kobaniyê ji dest bistînin û wan li gor berjewaniyên xwe çî partîti an serkirdeyî û ya beşê xwe bajon û ji bin basêkên wan bi dernekevin. Herêmen Kurd li Sûriyê bûne meydana dogş û gizgizoyan di navbera partiyên kurdistana bakur û başûr de, her alîk ta kîjan astê deshilatdariya xwe li serê gelê Kurd li welêt cibicî bike û wan berdê bin rûyên hev, û kes û partiyan li gor bejan xwe peşkin û birêsin. Hemî kirar û liva xwe jî di bin siya ramana netewî dikşînin. Ew sedema serke ye ku îro tevgera Kurdên Sûriyê ji serê perçe bûye û hêj berdwame û siya wê ne baş tê ser têkiliyên tevgera me û derûna gelê me li vî beşî.

Tevî ku ev kirar û têkiliyên durist û ne durist, ketin û rabûna tevgera kurdî li Sûriyê bi xwe re asta hişiyarê baş ber pêş çûye, çiqas êş û babelîtên tîne serê netewan û wan diguvin, li dawiyê dibin hilpişka şaristaniyê û wangelan ji qonaxa paşmayîyê derbas qonaxek pêşketinê dikin. Wek nimûne hilweşadina dewleta Capanî pîştî lêdana bi çekên nûklerî, û şikandina dewleta Gêrmenî û bûne du beş (Rjoava û Rojhilat), aniha ew herdu dewlet di kîjan qonaxa şaristaniyê de ne?

Ramana netewî û pêşketina xwe di nav civakê de baş e û hest bi heve tîne girêdan,

daxwez û hêviyan dikin yek û pir xewn li ser tîne avakirin, lê di pîretîkê de berjewendiyên aborî, dewletê û galan pirtirî ramana netewî biheve girêdidin, nimûne yekîtiya Awrûpa û Hindê... Ango dema avakirina dewletek yeknetew boriye û roj di sere derbas bûne.

Lê em Kurd hêj bê dewlet in û mafên wan hêj hatî xwerin, ne durist e ku beşek nûsa xwe bi yê din ve girêde, û tevgera beşekî birame ku ew nûnera tevgera beşê din bin destê xwe ke, an jî xwe li dêvla wan pêkêş bike, çî bi ramyarî û çî kiryarî be. Ger ew kar durist ba, Erebi di ser bîst dewletan re ne. Bila yekê yê din tev di bin destê xwe kira û bigota ez nûnerê netewa Ereban tevan me. Ango pir netew hene tekdwlet in û ji yekê pirtir hen, wek du Korî... û çiqas bi hev re ketine ceng û dogişan, û gelek netew jî hene di nava pir dewletan de belav bûne, û ji çarenûsa xwe bêpar in. Nimûne Kurd, Emezîx... Serdema ya dewletên fidral, konfidral û laperbûna (girse) aborî ne, ne yê dewletên yeknetew û bi darê zorê çemberkirî ne. Civaka vekirî bi xwe re hişê vekirî tîne, û şaristaniya pêktîne.

A me tevgera Kurdên Sûriyê divê bawerî bi xwe xurt be û berjewendiya doza xwe di ser hemî tiştên din re be, û xwe bi xwe serkirde bike û keftelesta xwe bi hemî pêkhatên konevanî û civakê... yê gelên sîrî re bike, û têkiliyên terezû û bi pîvan bi tevgera kurdistanî re li hemî perçan wek hev lê binêre û li ser wê bingehe jî ...

## Xebatkar, Rewşenbîr û Nivîskarê Kurd Arif Hiso Koça Dawî Kir



**R**oja Duşembê 19.12.2022-an, li Nexweşxaneyê DIL û ÇAV, û piştî kirîzeke dil a dijwar, mamoste Arif Hiso xatir ji dunya gewrik xwest û ji nav me bar kir.

Bi xemgîniyeke giran, bi êş û jan û çvên şil, birek dost û hevalên wî û rêveberiya Nexweşxaneyê pê re çûne derveyî bajêr û xatir jê xwestin, û kerwanê hevalan bi rêket û cendekê wî birin gundê wî Çelebiyê/Kobaniyê, bi beşdariya gelek heval, dost, hezkirên wî û nûnerên partiyên siyasî li (bi) axê hate spartin.

Arif Hisên di sala 1965an de li gundê Çelebiyê ku li Başûr û Rojhilatê bajarê Kobaniyê bi 54 km dikeve jidayîk bûye, xwendina xwe ya seretayî li gundê Çelebiyê bidawî kiriye û bawername navîn û amadehî ji Dibistanên parêzgeha Reqayê wergirtiye. Piştî, xwe li zanîngeh Bêyruût Elerebî tomar dike, lê ji ber rewşa wî ya aborî, nikarîbû xwendina xwe bibe serî.

Li parêzgeha Reqayê û Helebê demeke dirêj wî karmendî di sazîyên dewletê de kiriye. Di temenê piçûkayî de wî guh daye nivîsandina bi zimanên Kurdî û Erebî, gelek gotar di rojnameya Newroz û kovara Elhîwar de weşandine, û du berhemên wî hatine çapkirin, a yekem bi navê «Gotinên Pêşîyan» û ya diwem «Destpêka Rêzman» çap û belav bûne.

Hêjayî gotinê ye ku ligel guhdana wî li zimanê dayîkê, wî girîngiyeke mezin dabû

xebat û têkoşeriyê bo netewa xwe ya bindest jî, lewre bi dehan sal bê dudilî, wî li kêleka hevalên partiya xwe kar û xebatek bêhempa ji bo gelê Kurd kiriye.

Her wiha ew endamê Saziya Fêrkirin û Paristana Zimanê Kurdî bû, bi sedan ku em nebêjin bi hezaran, keç û lawên kurd li ser destên wan fêrî zimanê dayîkê bûne.

Di behiya wî de, gelek gotin hatin pêşkêşkirin û gelek birûskên sersaxiyê hatine xwendin ku yek ji wan jî Sersaxiya Rojnameya «NEWROZ» bû.

Cihê Bavê Rizgar bihuşt be, serê malbat, heval, dost, şagirt û hezkiriyên wî her sax be.

Li jêr deqa Sersaxiya NEWROZê ye:

### SERSAXÎ

Malbata HISO li hundir û derveyî welêt...

Dost û hevalên rêzdar...

Li roja Duşembê, 19ê Berçilleya 2022-an, bi

xemgîniyeke mezin, me xatirê dawî ji xebatkar û rewşenbîrê Kurd ê dilsoz Arif Hiso xwest.

Kekê Arif, pêşî endamê Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî bû, û paşê, li Zanîngeha Rojava û ya Kobaniyê, ew bû mamosteyê ziman û wêjeya Kurdî û li ser destên wî, bi sedan keç û lawên Kurd fêrî zimanê dayîkê bûne.

Ji bilî xebat û berhemên wî li zanîngehê, wî gelek gotar bi zimanê Kurdî di rojnameya NEWROZê de weşandine, derd û kulên xelkên Kobaniyê dêrane.

Bi vê boneya xemgîn û dilêş, bi navê Desteya NEWROZ, em sersaxiyê ji malbat, dost, heval û hemû hezkirên wî re dixwazin û hêviya me li cî ye ku xebat ji bo pêkanîna armanc û baweriyê wî, ranaweste, û her dê berdewam be!

Desteya Rojnameya

NEWROZ

19.12.2022 Z

## Li Erebestana Siûdî Mamoste Mihemed Şerîf Mişko Koça dawî kir

**R**oja Înê 30.12.2022-an, li wilayeta Cêzan a Erebestana Siûdî, Maomsteyê Fîzyayê, perwerdekarê nskrî û hêja Mihemed Şerîf Mişko, bi kirîza dil, koça dawî kir.

Sala 1956-an, li gundê Şebek ku nêzikî bajarokê Rimêlanê ye ew jidayîk bûye, xwendina xwe ya seretayî, navîn û bekelorya li dibistanên bajarê Qamişloyê xwendîye, paşê, li sala 1980, bawernameya Fîzya ji zanîngeha Helebê wergirtiye û li bajarê Qamişloyê mamostetî kiriye, û



li sala 1988-an, bi girêbesta kar Çûye Cezayîrê, 4 salan li wir û salekê li Lîbya, mamostetî kiriye. Ji sala 1995-an ve çûbû Erebestana Siûdî, bêtirî 20 salan li wir jî mamostetî kiribû û li sala 2018-an, veqeriyaye welatê xwe, li Qamişlo rûnişt.

Beriya 6 mehan, bi seredaneke digel hevjinê xwe çûye Erebestana Siûdî, û ji nişka ve, roja Înê 30.12.2022an bi jana dil, koça dawî kir û roja Şemiyê, 31.12.2022-an, li gundê Zabya, wilayeta Cêzan li axê hate sipartin.

Mamoste M.Şerîf ji malbateke welatparêz û xebatkar e, sala 1976-an, ew tevî rêzên partiya me bûye, û ta berî ku ew here derveyî welêt, karê rêxistinî dikir. Her wî rewşa rêzanî dişopand û ta roja dawîya temenê xwe,

ew nêzikî nerîn û baweriyên partiya xwe bû.

Bila cihê wî bihuşt be, serê malbat, dost, heval û hogirên wî sax be!

### Nanê xwe... Dûmahîk

vê re têklidar bin, û li aliyê din jî partiyên perçên din jî wiha û li ser wê bingehe li tevgera Kurdên Sûriyê binêrin û li gora wê pîvanê herin. Bila naveroka vê gotina pêşîyan» Çûkê guran be ne yê biran be «bicih netê.

# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (229): Gundê «Ecnadîn» ê niştêcîkirinê, girtinê bêsûcane, geregoşî û qutkirina darên zeytûnê, vêrgiyên El'emşat û El'şerqiyê

قرية «أجنادين» الاستيطانية في ناحية جندريس، بين حقول الزيتون على أرض مستولى عليها كانت مشجرة بالدراق، افتتحت بتاريخ 4 كانون الثاني 2023م



Piştî ku Anqerê bi gulîstaneke pêkhatî ye, Şamê re dest bi û piroje li ber ferekirinê lihevhatin û lihevkerinê ye; Ê ew bi destê «Tîpa kir, û destpêkirina Idlib El>weten» û «Ebdo hevdîtinên siyasî li ser Zemzem» - serkêşekî asteke dîplomatîk ragîhand, Milîseyên «Nûr El>dîn nevehesî û xurcilandin kete Zenkî» û bi pereyên nav refên Milîseyên «Artêşa «Komela Ecnadîn a Niştîmanî ya Sûrî» û bi ser Feleştînî» tê cîbicîkirin. de jî nav Hemahengiya Divê were bîranîn jî ku Sûrî - Ixwanî, bi taybetî gund li ser erdekî çandiniyê jî çarenûsa wan berve -/24/ donim bi darên nediyariyê ve diçe; Bi ser çeteliyê hatibû çandin wê giştî de, ew rojekê ji û tev ji aliyê «Zenkî» ve bînpêkirin û tewankariyên hatibû hilkirin- hatiye xwe di dermafê Herêma avakirin, dikeve navêna Efrînê û niştêciyên wê yên herdu gundên «Hemêlkê» û resen de namînin. «Qîlê Jêrin» - Rojhilatê B.

## Ev jî bînpêkirin û tewanin têvel in:

### = Gundekî

### niştêcîkirinê:

Di çarçewa pilana guhertina demografi ya ku Destlatên Turkiyê rêbaz dîkin de, li /4/î Rêbendana 2023an. Z, Gundê «Ecnadîn» ê niştêcîkirinê yê nû li Navça Cindirêse hate vekirin; Ew ji /40/ yekîneyên niştêcîbûnê, amojgeheke lezberkirina «Qur»anê», mizgeft û

gulîstaneke pêkhatî ye, û piroje li ber ferekirinê ye; Ê ew bi destê «Tîpa Idlib El>weten» û «Ebdo Zemzem» - serkêşekî Milîseyên «Nûr El>dîn Zenkî» û bi pereyên «Komela Ecnadîn a Feleştînî» tê cîbicîkirin.

Divê were bîranîn jî ku gund li ser erdekî çandiniyê -/24/ donim bi darên çeteliyê hatibû çandin û tev ji aliyê «Zenkî» ve hatibû hilkirin- hatiye avakirin, dikeve navêna herdu gundên «Hemêlkê» û «Qîlê Jêrin» - Rojhilatê B. Cindirêse, û ew ê koçberine zorane ye (zaroyên herdu dîlovanberên bira «Mecîd û Mûrad kurên Menan Mihemed») ji xelkê Gundê «Şîtkî» ye, û piştî dagîrkirina herêmê li 2018an. Z ve, ji aliyê milîseyan ve hatiye desteserkin.

### = Girtinê bêsûcane:

- Li 24.12.2022an. Z, Milîseyên «Asayêşa Sivîl li Bajarê Efrînê» Hemwelatî «Hemze Isma»îl Hec

Hemze /40/ sal» ji xelkê Gundê «Xirabî Şera» û li bajêr rûdine, bi behaneyê têkeliyê bi Rêvebirîya Xweser a berê re girt, û piştî heftakê -piştî standina baceyeke diravî- ew berda, bi taybetî jî «Hemze» halxweş e û dîkaneke wî ya firotina hêsin jî li Herêma Pêşesaziyê heye.

- Li 1.1.2023an. Z, Milîseyên «Feyleq El»şam» xort «Hisên Mihemed Şêxo /25/ sal» ji xelkê Bajaroka «Meydanekbezê» - Reco girt, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

### = Geregoşî û serberdayetî:

- Piştî biservebirina hin malên ku anîndeyên Êla «El»begare» li B. Cindirêse têde rûdinin û girtina yekî daxwazkirî ji aliyê Milîseyên «Asayêşa Leşkerî» ve, li şeva 3.1.2023an. Z giropeke çekdar ji êlê êrişî ser navenda asayêşe kir, makîneyine wan şikandin û di navbera herdu aliyan de qurşîn hatin avêtin; Ê redkirin ji wê re, li siba roja din, Istîxbaratên Turkiyê û bi hevaltiya milîseyan hejmarek ji yên êriş kirine girt.

- Li şeva 4.1.2023an. Z, li Taxa Eşrefiyê - B. Efrînê, bi sedemabelavkirina xisteyên alîkariyên xwariniyê yên mehane, pevçûnek

di navbera anîndeyan de çêbû, qurşîn hatin avêtin, Milîseyên «Asayêşa Sivîl» destêwerdan kir, û di encamê de hin pevçûnker birîndar bûn.

### = Bînpêkirinê din:

- Li 23.12.2022an. Z, çekdarên Milîseyên «Feyleq El»şam» êriş mala temenmezina Kurd «Fatîme Cinêd/75/sal» (bi tenê li Gundê «Basûfanê»- Şêrewa rûniştîye) kir, lêdan lêkir, bi kendirê girêda, û zêr û peren jê dizîn.

- Milîseyên «El»weqas» beşek mezin ji dareke sindiyanê ye Romî ye temenmezin di erdekî «Bijîşk Xelîl Hisên Axa» de li Bajaroka «Kefirsefrê» - N. Cindirêse qut kir.



- Li vê dawiyê, milîseyan dora /30/ darî zeytûnê yên temenmezin -sisê jê ji kokê ve- yên «Nîdal Mistefa, Enwer Simo, Nûrî Miho, Henîf Miho» bêwijdan qut kirin, li herdu gundên «Me»imila û Umera» - Navça Reco.

- Piştî ku «Welîd Hisên El»casêm ê ku bi (Sêf) tê naskirin» birayê «Mihemed El»casêm - ebû Emşe» (serkêşê Milîseyên «Firqit El»sultan Silêman Şah» ji Navça «Şiyê») ..... 9

# QET JI BÎR NABE

## Zelîxan Cimo

Bila ew roj ne ji rojan ba, gava me pişta xwe da kişwer û warê bav û kalan. Ew roja dijwar û pir zehmet û bi>êş, roja wendabûn, û hesret û kederê, roja ku xelkê me yê Efrînê, di bin metirsiya balefir û topan de, bi dilên melûl û şikestî dest ji malmewdanan berda bûn û surgun bûbûn, mîna pezekî bê şivan bi çol û baniyan ketibûn, û di riya «Çiyayê Ehlan - Lêlûn» a tekane re girangiran, gavek li pêş û dudu li paş, kabşikestî û piştûz berve qedereke nediyar ve dimeşîn, bê ku zanîbin bi kû ve derin, lê

dilên wan li şûn wan diman û ji buhişta rengîn nedibûn.

Ew roja ku tê de zarok digiriyan, nalenala pîr û kalanbû, riya «Ehlan» bûbû riya windabûn û mirinê, em bûbûn mîna kesên ku dilên wan bi tîrên êgir hatibin sotin û bûbin xwelî, eynî ku roja qiyameta me bû!

Lê tiştê herî seyr û ecêb! Pîştî ewqas xişim û bêtarên ku bi ser serê me de hatine, dagîrkirina welatê me, hemî bînpêkirin û tewanên têvel ên ku di dermafê xelkê me -yên li hundir mane- û xwezayê de tene kirin, metirsiya li ser hebûna me Kurdan, û bisedhezaran penaber û koçberên me



yên di bin çadîran de, hîn hin xêrxwaz û berketî hene dibêjin: De ka em pir xwe bi bûyerê ji xwe re nekin qisewet û bar, û jiyanek nû li gor demê ji xwe re bihûnin?!

Ma gelo rast mirovê welathez û gelhez kane tiştê bûye û dibe ji bîr bike? Emê çawa welat, ax, hebûn, rûmet, zaroktî, ciwanî, dost, hogir, cîran, mala bavê xwe, malbat, gorên meriv û xizman û merqedên

pakrewanên ku ji bona ax û hebûna me canê xwe kirine qurban jibîr bikin? Na û sed carî na, tu carî em kişwera zeytûnan jibîr nakin, hêvî û viyana vegeêrê dê tim li cî be, û tim û tim û bi her awayî emê hewildana rizgarkirinê bikin, da ku rojek bê û em vegeerî Efrîna xwe - Buhişta cîhanê - û axa wê ya pîroz hembêz bikin û ramûsin, û lêborîna destjêberdanê jê bixwazin!

## Efrîn di bin... Dûmahîk

bi derxistina biryarekê ji komîtak sê>alî ve li destpêka sala borî hatiye bidûrxistin, careke din ew vegeerîya ciyê xwe û vêrgiyên ji /1000-5000/Dolar Emrîkî li ser bidehan Malbatên Kurd (ên ku ji Turkiyê û Libnanê vegeerîne Bajaroka Şiyê û gundine pêve girêdayî) ferz dike.

- Li vê dawiyê Milîseyên «Ehlar Elşerqiyê» vêrgiyine nû /2-5/tenekê zêtê zeytûna -heryek 16KG sade- li ser jinine jinebî yen Kurd li Bajaroka Reco û gundine di bin desteseriya wan de (Qêsim, Çêqilme, Kûra, Şediya, Firfirkê...) ferz kirin, bi behaneyê ku tevahiya weresê li wan nakeve û tenê rêjeyek jê



para wan e, û ji wan li Gundê «Kûra» ev hatin naskirin: Selwa Umer Mihemed, Ewaş Mistefa Îbo, Fatîme Mihemed Bekir, Henîfe Bîlal, salîhe Hesên keça Mihemed Elî.

- Wêneyeke nûjen ji Pira «Heredere/Heşargê» (ya ku dirêjahiya wê digheje /450/ Metroyî, nêzîk Gundê «Maseka» - N. Reco, li sala 1912an. Z hatiye avakirin, û li herêmê weke zanînwerekê ye) ya xeta «Tirêna Rojhilata Lezgîn

- Elşerq Elserî» gihîştê me, û bi beramberkirina wê bi wêneyine kevin re - berî dagîrkeriyê, bi zelalî girseya dizînen ku ji aliyê Milîseyên «Fîrqa Nehan(Elfîrqa Eltasîe) - Artêşa Niştîmanî ya Sûrî» ve gihîştinê -text, stûnên bin xetê û hesinê xetê- diyar dibe; Ê ew jî di çarçewa siyasetên rêbazkirî de yê ku Destlatên Dagîrkeriyê ji bo roxandin û tunekirina binevahiyan li herêmê -toreyên elektirîkê yê giştî

û hevgîhanên zemînî û xilyewî û navend û bircên wan, xeta tirênê...û yê din- dimeşînin de ye.

Eger hestiyariyek netewparêziyê li ba yekî ji Sûriyên ku rih û simêlên xwe dane dest Turkiyê û dijmantîya Kurdan kirine mabe?!, Jê tê xwestin ku pirottestokirina xwe ji destêwerdana Turkiyê ya qebhet û nemafdar re di rewşa Sûriyê de û siyasetên wê yê li dijî Kurdan ragihîne, û bînpêkirinan li dijî wan rawestîne.

08.01.2023 an

Nivîsgeha ragihandinê-

Efrîn

Partiya Yekîti ya

Demokrat a Kurd li

Sûriyê

# Di Gulistana Weşanên Kurdî li Sûriyê de... Kovara PIRS û Rojnameya NEWROZ

## Newafê Bişar



Roja Înê 11.11.2022 Z, Bi serperiştiya Desteya Çandê li Herêma Cizîrê, Heştemîn Mihrecana Çand û Hunerê li HOLA «Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê» dest pê kir. Li Roja Şemiyê 19.11.2022, di simînerekê de ku birek rewşenbîr û hezkirên zimanê Kurdî beşdar bûn, min ev gotara li jêr xwend:



Gelek xwendevanên zimanê Kurdî û şopîner dizanin ku Kovara PIRS û Rojnameya NEWROZ, du weşanên bi zimanê Kurdî xwedî nav û dîrok in, eve nêzikî 30 salî ye ku li Sûriyê ew çap û belav dibin, li kêleka xuşkên xwe yên dîtir, li ser şopa Hawar û Ronahî yê, şopa parastin û pêşvebirina ziman û çanda Kurdî ew birêve diçin.

Bi kurtî be jî, di vê kute-gotarê de, dixwazim li ser kurtejiyan û dîroka wan herdu weşanan hin agahiyan binivîsim û hin belgeyan jî pê re belav bikim.


### Kovara PIRS:

Li gora belgeyê fermî,

roja 27ê Êlûna sala 1992-an, li bajarê Qamişlo, nûnerên 3 kovarên Kurdî (Gelawêj, Stêr û Rê) civînek lidar xistin ku ez yek ji beşdarên wê bûm, û biryar bi rawestandina hersê Kovaran, û li şûna wan, kovareke Kurdî demsalî, serbixwe û bi navê PIRS standin. Hejmara wê ya pêşîn li Newroza sala 1993-an hatiye çapkirin û belavkirin.

Beşdarên civîna damezrandina PIRSê yên ku belge imze kirine ev kes bûn, weku di belgeyê de hatiye:

1. **Berzo (Berzo Mehmûd)**
2. **Tengezar (Tengezarê Marînî)**
3. **Royar (Merwan Osman)**
4. **B. Dara (Newafê Bişar)**
5. **B. Goran (Ebdussemed Mûsa)**
6. **B. Şehîn (Dr. Azad Elî)**



Ji sala 1993-an ta sala 2016-an, 54 hejmar ji kovara PIRSê çap û belav bûne, û ta dawiya temenê xwe, gorbihuşt Rezoyê Osê, berpirsê Desteya wê maye. Di van salên dirêj de, gelek nivîskarên hêja ji Cizîrê, Efrîn û Kobaniyê di Desteya wê de bûne endam, û ji bo pêşxistina wê, ji dil û can, bi dilsozî xebateke bêwestan kirine ku keda wan nayê jibîrkirin!

Navên rewşenbîrên di Desteya Kovarê de kar kirine

ku tene bîra min, ev in. Bi hêvî me ku min kesek jibîr nekiribe:

Rezoyê Osê, Berzoyê Mehmûd, Dr. Ebdulmecîd Şêxo, Heyder Umer, Dilawerê Zengî, Newafê Bişar, Tengzarê Marînî, Dr. Rozad Elî, Merwan Osman, Mrewan Berekat, Dr. Kamîran Bêkes, Ebdusemed Dawûd (Bavê Evesta), Kemal Ebdalo, Mihemed Qere Hesên, Mihemed Emîn Umer û Nûşîn Bêcirmanî.

Desteya Kovarê bi rastî serbixwe û xwedî biryar bû. Rast e ku Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd piştgiyariya wê dikir, ew çap û belav dikir, lê tu destêwerdan di karûbarên desteya wê de nedikir.

Weke bûyereke balkêş tê bîra min, rojekê berpirsekî Partiyê bi Desteya PIRSê re civînek lidar xist û wiha got:

«Gelî biran, wekî hûn dizanin em tevî Hevbendiya Demokrat a Kurd li Sûriyê bûne, Partiyên Hevbendiyê Kovarên xwe yên bi zimanê Kurdî rawestandinê û li şûna wan Kovareke nû bi navê BIHAR weşandine. Ji me jî weke rêxistin hatiye xwestin ku em PIRSê rawestînin û du endaman ji we tevî Desteya BIHARê bikin!».

Wê demê, bersiva Desteya PIRSê bi yek dengî ev bû:

«Li ser qapê kovara me hatiye nivîsandin ku ew kovareke serbixwe ye, navê tu partiyên li ser nehatiye tomarkirin. Hûn mafdar in

û dikarin piştevaniya xwe jê re bikşînin û nema wê çap û belav bikin, lê weke Deste, em li ser vê xwestekê erê nakin».

PIRS li biryara xwe bû xwedî, Partiyê û Hevbendiyê jî rêz li biryara wê girtin û wê weşana xwe berdewam kir.

Hêjayî gotinê ye ku ji sala 1993-an ta sala 2016-an, 54 hejmar ji Kovara PIRSê çap û belav bûne, endamên desteya wê bi hev re, li bajarê Heleb, Efrîn û Cizîrê bûne mêvan û ji bo derxistina wê civîn lidar xistine.

Lê, mixabin, ji ber sedemên şerê ku eve derdora 12 salan e li welatê me berdewam e, ji sala 2016-an ve, Kovar rawestiya ye, tu hejmar jê belav nebûne, lê di heman demê de tu biryara fermî ji bal Desteya wê ve bi rawestandîna jî tune ye.

Di vî warî de, ez hêviya vejîna Kovarê dikim, da ku careke din ew li ser lingan raweste, li xwendevanên xwe vegere, zanîn, wêje, helbest, çîrok û pexşanê ji hezkirên ziman û wêjeya Kurdî re belav û pêşkêş bike, rewşa civakî, rewşenbîrî û jiyana gelê me berçav bike, û ji bo zimanê Kurdî, xebata xwe ya pîroz berdewam bike.

Herweha, pêwiste ku di rojêke mîna îro de em jibîr nakin ku, rêz û silavên germ ji hemû nivîskarên wê re, ji Endamên Desteya wê re ku pir cefa kişandine pêşkêş bikin, ji miriyan re dilovanî, û ji saxan re jî ..... **11**

## Hevdîtîna di Navbera Partiya me û PDK-Iraq de

Li Navenda «Nivîsgeha Peywendiyên Niştîmanî û Kurdistanî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê-Iraq», roja Çarşembê 21.12.2022, hevdîtînek di navbera şandeke partiya me û «Nivîsgeha Peywendiyên ya PDK-Iraq»-ê de lidar ket. Şanda partiye, ji van hevalan pêkhatî bû:

Mehmûd Mihemed/  
Endamê Komîta Siyasî û

nûnerê Partiyê li Herêma Kurdistanê, Weys Mustefa/  
Endamê Komîta Rêvebir a Partiyê û berpirsê Rêxistina Herêmê. Heval Dr. Hesên Çawîş û Ferhad Weyso Mihemed/  
Endamên Serkirdayetiya Rêxistina Partiyê li Herêma Kurdistanê.

Şanda Partiyê ji bal berêzan: Dr Cefer Îmînkî/ Serokê Nivîsgeha Peywendiyên û berpirsê

dosya Sûriyê, mamoste Nîzar Botanî û hin endamên din yê Nivîsgehê ve hate pêşwazîkirin.

Di hevdîtînê de, rewşa siyasî ya deverê bi gelemperî, û derd û kulên gelê me li deverên dagirkirî (Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî) bi taybetî hate gengeşekirin. Herwiha Partiya me, êrîşên dewleta Turkiyê ya dagirker li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê



û Herêma Kurdistanê, û êrîşên rijêma Îranê jî li ser Herêma Kurdistanê şermazar kir.

Li dawîya hevdîtînê, ji bo berdewamiya peywendiyên biratî, herdu aliyên tekez kir ku têkilî dê berdewam bin.


### Di Gulîstana... Dûmahîk

temenekî dirêj bixwazin!

#### Rojnameya NEWROZ:

Li destpêka sala 1995- an, girûpek ji dilhezên zimanê Kurdî ( Dr. Mihemed Ebdo Elî, Osman Mihemed, Mustefa Tatoz, Edîb Ibrahîm û Qazîqlî Mihemed «Bavê Leheng») - piştî bidawîkirina korsarêzimên a biserpereştîya Dr. Ebdild Mecîd Şêxo, û bi şewir û mişewir bi wî re, tekez kirin, ku gerek xebata bo zimanê Kurdî raneweste, karek were kirin, da ku, xebat û gotinên pêşewên Kurdan, ên mîna mîrê helbesta Kurdî» Ehmedê Xanî», mîrê alfebe û rêzîmanê kurdî «Celadet Bedir-Xan», û zimanzan û siyasetmedarê Kurd «Dr. Nûredîn Zaza «; Osman Sebrî û yê weke wan li erdê nemîne. Li dawiyê, ew bi hev re gihîştin rayekê, ku pêdivî bi weşaneke kurdî heye.

Hevdîtîna yekê ji bo derxistina belavokeke Kurdî, li destpêka Buhara wê salê, li ser bêdera «Gundê Tilifê»-



Efrîn, bi pakrewan «Kemal Henan» re hate kirin. Piştî wê hevdîtînê, li ser derxistina weşaneke Kurdî di bin navê partiye de û li ser asta parêzgeha Helebê erê bû.

Di Nîsana sala 1995-an de, yekemîn hejmara NEWROZ weke weşaneke xwecihî ji weşanên Partiya Yekîti li Helebê û Herêma Çiyayê Kurmênc hatiye belavkirin. Wêneyên herdu nivîskarên zimanê Kurdî Apo Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza her hejmar weke simbol, rûpela pêşîn a NEWROZê xemilandine.

Herweha, digel herdu wêneyan jî, pîrsa Ehmedê Xanî ya li ser hezkirina zimanê Kurdî, ya dibêje: «Ma mirov zaroyê xwe yê nexweş bi zaroyê cîran yê xweş diguhêre?» li ser rûpela pêşîn a rojnameyê her hejmar cih girtiye.

Piştî hejmara 10-an, NEWROZ ketiye qonaxeke nû, û ji hejmara 11-an, Avdara sala 1998-an ve, ew bûye rojnameyeke navendî ya Partiyê, û li seranserî deverên Kurdî li welêt belav bûye. Ta niha, 154 hejmar jê derçûne, û hejmara 155-an nêzîk dikeve destên xwendevanên wê.

Hêjayî gotinê ye ku di van 27 salên borî de, 4 endamên Desteya NEWROZê koça dawî kirine, ew jî ev in:

Pakrewan Kemal Henan, Edîb Ibrahîm, Mustefa Ellaş û Mihemed Zekî (Diljar Seyda). Bila Xwedê wan bibexşene û cihê wan bihuşt be.

Di vê simînerê de, ji Kovara PIRSê min gotarek bi navê DIRAV û sergotara hejmara NEWROZ ya bi navnîşana «Çima Rojnameya NEWROZ» ji beşdaran re xwend. Ê min gotara xwe bi van çand gotina bidawî aniye:

Li dawîya vê gotarê, ne ji deriyê belavkirina Şîretan, lê tenê dixwazim weke kes nerîna xwe derbarê

erkên rewşenbîr, bîrewer û nivîskarên Kurd bînim zimên û bibêjim:

Bila navnîşan û naveroka xebat û berhemên me, belavkirina çand û gotara rêzgirtina nerînên hev be, avakirina bawerî û hezkirinê di civakê de be. Di çarçewa yekîtiyê de, bila, û pir pêwîst e ku nerînên me ne yeksa bin, çimku cudahiya nerîn û bawerîyan, mak û jêdera pêşveçûnê ye, zengînkirin û pêşvebirina jiyana ramyarî ye.

Herweha, wêbaş be em jibîr nekin ku di siha çi saloxanên mezin û bilindkirina wêneyên sembolên Kurdan de, belavkirina gotara kîn, zikreşî û dubendîtîyê di nav Kurdan de, avê berdide coka aşê neyarên gelê me û dilê wan ê reşî kîndar, hênîk dike.

Hemû bi hev re em dest bidin hev û li ser bingeha belavkirina çanda nûjen a aşî, azadî û wekheviyê em kar û xebatê bikin.

02.11.2022Z 2634 K

# Careke din Li Parîsê, Êrîşeke xwîndar !

Berî nîvroya roja Înê 23.12.2022Z, Navenda Komeleya Ehmed Kaya li Parîsê, raştî êrîşeke xwîndar hat. Ji nişka ve, mirovekî Frensî yê 69 salî, digel çekên xwe derbasî navenda Komeleyê dibe, bi hovîtî, kesên têde gulebaran dike. Di encamê de, 3 kesên (Hunermend Mîr Perwer, Emîne Kara û Ebdullah Kizil) jiyana xwe ji deşt dane û 3 kesên din jî birîndar bûne.

Serokomarê Fransa Makron, Şalyarê karûbarên derve yê Emerîka Pilinkîn, Şêwirmendê Almanyaya Olaf Şolts û gelek berpirsên Fransa û dewletên cîhanê, ev kiriyara hovane dijî mirovên sivîl şermezar kirine.

Hêjayî goinê ye ku eve ne cara piştî ye li Parîsê Kurd tûşî êrîşên terorîst dibin, lêbelê berî 9 salan,



Evîn (Emine Kara)

09.12.2013-an jî, li ser deştê MÎT-a Turkiyê, 3 jinên Kurd ên çalak hatine terorkirin, ew jî ev bûn: (Sakîne Cansiz, Fîdan Doxan û Leyla Şaylemiz, bê ku kujer radeştî dadgehê bibin û sezayê xwe bibînin!

Piştî vê tewana hovane, bi dehan kes ji revenda Kurd li Parîsê xwepêşandan lidar xistin û




Mîr Perwer (M. Şirin Aydın)

ji ber coşa wan ya germ, di navbera wan û polîsan de pevçûn derkete holê.

Şalyarê Dadmendiye yê Fransayê tekez kir ku bi dehan kes ji revenda Turk tevlî xwepêşandaran bûne, şikandin û şewata trumpêlan bi deşt wan hatiye kirin.

Ji bo di mij û dûmana qelebalix û tundiyê de mafê pakrewanan winda



Abdullah Kizil

nebe, rê li ber xêrnexwazan bête girtin, bila her dem xwepêşandanên Kurdan aştîyane û li gora zagonên wan dewletan bin.

Giring e dewleta Fransa bi zelalî encamên vê kuştare ji raya giştî re ragihîne.

Cihê pakrewanan bihuşt be, cansaxî ji birîndaran re û rûreşî ji şoven û terorîstan re be!

## ( JIN, JIYAN, AZADÎ ) li ser Dergeha BRANDENBURG-ê

Wêke piştgiriye bi xwepêşandanên gelên Îranê û xebata jinan bo bideştixistina azadiyê re, roja 14.12.2022Z, dirûşma (JIN, JIYAN, AZADÎ) li ser Dergeha BRANDENBURG-ê li Berlînê, bi zimanê Kurdî û tîpên latînî hatiye nivîsandin, û dirûşma Kurdî golvedaye û bûye dirûşmeke navnetewî.



Xebata jinê pîroz e!

Aştî, Azadî û Wekhevî

ji gelên Îranê re!

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yê di girtîgehên Sûriyê de**